

Gotegota hebûna
“Corona” berî Çînê
li Îranê »»» R:7



Hawara
bêdengiyê!
»»» R:2



Kêrhatîbûna
bêçine
»»» R:4



Urmiye di
bin gefên berde-
wam de ye
»»» R:6



Plana Trump ya
ji bo aştîyê di navbera
Îsraîl û Fîlîstîniyan de û
bandora wê li ser Rojhi-
lata Navîn
»»» R:8



Agirî

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

*Duheftînameyek Siyasetî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (367) 05-02-2020 Buha (1000) Tûmen*

Pêngaveke dîrokî di salvegereke dîrokî de

Navnda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê, semînarêk bi hilkefta 74'ê min salvegera avabûna Komara Kurdistanê, di 4 beşên cuda de lidar xist.

Di wê semînarê de, ku bi navê “Komara Kurdistanê ezmûneke mezin û hêmayê yekrêzî ya netewî bo avakirina serweriya nîştîmanî” pêk hatibû, nûnerên her yek ji wan 4 Partiyên beşdar ên wê navendê, mijarên xwe pêşkêş kirin.

Ew semînare di piştînivroya roja 2'ê Rêbendanê, di hola “Pêşewa” a bajarê Hewlêrê de, bi amadebûna beşek ji alî û nûnerên Sazî, Partiyên 4 aliyên Kurdistanê, kesayetiyên siyasî yên Kurd, endam, kadir û pêşmergeyên Partiyên Kurdistanê û mêvanan, bi rê ve çû. Di wê semînarê de, “Hesen Şerefî”, “Ebdullah Azerbar”, “Kemal Kerîmî” û “Riza Ke'ibî”, her yek ji endamên Partiyên Navenda hevkarîyê, ji aliyê xwe ve, basa avabûna Komara Kurdistanê kirin.

“Hesen Şerefî” basek li jêr navê “Taybetmendiyên netewî û demokratîk yên Komara Kurdistanê û destkev-



tên wê” pêşkêş kir.

“Ebdullah Azerbar” basek li jêr navê “bandordariya Komara Kurdistanê li ser berfiribûna seha netewî, di parçeyên din yên Kurdistanê de” pêşkêş kir.

Herwisa “Riza Ke'ibî” jî, basa xwe pêşkêş kir ku, li jêr navê, “kêmasiyên Komara Kurdistanê û sedemên herifîna wê Komarê” bû. Semînar, piştî Sirûda “Ey Reqîb” û sekîrandina xûlek bêdengî ji bo rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdan deşt pêkir.

Di beşa yekê de, “Kemal Kerîmî” îşare bi çendîn fakterên girîng yên dîrokî û siyasî, di serdema Komara Kurdistanê de, bo amadebûyan kir.

Di beşa duyem de, “Hesen Şerefî”, bi baskirin li ser rewşa wê demê a Komara Kurdistanê, wekî xisarek got: “Ya girîng ev e ku di wê serdemê de, tevî hebûna hoz û eşîretên zaf, Komarê karî hemûyan di bin alayekê de û bi xweşteke hevpar a netewî wan kom bike, niha di wê serdemê de ku pêşketî ye û bi 10'an Partiyên Kurdan hene, lê heya niha nekarîne wekî serdemê “Pêşewa Qazî”, hevaheng û yekrêz bin.

Di beşa Sêyem de, “Ebdullah Azerbar”, basek li ser hewlên Rîzaşahê Pehlewî, wekî siyaseta yekdestkirina gelên Îranê û asmîlekirina wan, di nav çand û zimanê desthilatdariyê de û berfirehtirbûna hizra şovenîstî û rasîsma Îranê kir.

Di beşa dawiyê de, “Riza Ke'ibî” bi baskirin ji cudahiyan qonaxan û cudahiya di navbera qat û nivşên duh û yên îroyî de, xisarnasiyeke kurt di vê derheqê de kir.

Sergotar

Hawara bêdengiyê!

N: Kerîm Perwîzî

Deşhilatdarên dîktator, her-tim hildana dengê nerazîtiyê weke tawaneke mezin dibînin û wan kiryanan hêjayî tev sizayan dibînin. Tawanbar û dîktatorên weke Xamineyî û sîstema dijî mirov û dirinde a welayeta feqîh, dixwazin hemû welatî guh bidin wan û tenê van karan bikin ku ew dixwazin û qet dengê dijber ji wan dernekeve.

Dema ku civak, tevgerekê li dijî xwestekên hikûmeta tûtalîter pêk tîne, ev tevger weke parazîteke mezin bandorê dike ser mejî û hizra cemidî a deşhilatdaran û ewê bi xurtî li hemberî wan derkevin. Ji bo mînak rejîmê di kuştara Xezelwera îsal de bi tundtîrîn şêwe hovîti û dijîmîrovbûna xwe nîşan da.

Lê belê tenê riyek ji bo çalakî û nîşandana nerazîtiyê li pêşberî civakê nîn e. Her civakek riyên nû û taybet ji xwe re dibîne ji bo ku dîktatoran ji nav bibe.

Van rojan careke din sîstema Komara Îslamî li şanogeriya hîlbijartinan nêzîk dibe da ku dîsa ruxsarek deştîkird ji xwe re ji sindûqên xapînokiyê berhem bîne. Bi vî awayî ew dixwazin kesên ku bi van xapînokîyan ji sindûqan derdikevin, weke nûnerên Meclîsa rejîmê bidin nasandin. Ji bo vê armancê jî car din hin mijarên kevn derketin holê.

Pêşîneya tijî derew a rejîmê û ezmûna zêdetirî çil salan nîşan dide ku meclîs di vê sîstemê de şano ye û tenê rê tê dayîn pasdar tê de beşdar bibin. Hin kes hene ku dibêjin take çareserî ev e ku em bikarin di riya hîlbijartinan de hewl bidin hin tiştan dabîn bikin da ku tevgera siyasî ber bi tindiyê ve neçe

Peyama hevxemiyê a Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ derheq erdheja Bakurê Kurdistanê



Mixabin di encama erdheja Bakurê Kurdistanê de ku roja Înê 4'ê Rêbendanê çê bû, sedan kesan jiyana xwe ji deşt dan û sedan kes jî birîndar bûn. Herwisa vê erdhejê, malwêranî û xisareke mezin a malî jî bo xelkê vê deverê li pey xwe ve anî.

Heya niha jî çarenivîsa gelek kesên ku di bin xaniyên kaviybûyî de mane nayê zanîn. Bi vî awayî ev metirsî heye ku hejmara kuştî û birîndaran zêdetir bibe.

Êş û azara vê bûyera dilêş bi taybet di demsala sir û seqemê de, bo kesûkarên qurbaniyan û birîndarên vê bûyerê gelek zêde dibe.

Bi helkefta karesata erdheja Bakurê Kurdistanê, em sersaxiyê didin xwişk û birayên xwe li Bakur û bi taybet kesên ku piştî erdhejê rizgar bûne. Em xwe hevparê xema xizm û kesên berketiyên erdhejê dizanin û hêvî dikin tendirûstiya birîndarên vê bûyerê vegere.

Lêpirsyarê Giştî ê Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê

Mîstefa Hicrî

û welat nekeve nav agir. Herwisa ew kes, hin hêncetên din jî tînin da ku xelk neçar be bejna xwe li hemberî dîktator bitewîne.

Dingekî din jî dibêje baykotkirin, rewşê naguhê û wê rejîm, moreyên xwe bişîne meclîsê. Ew îdiayê dikin ku baykotkirin, wê karê rejîm hêsan bike û divê di navbera xirabî û pir xirabtiran de, kesên xirabîr bîne hîlbijartin da ku rê li ber rejîmê bê girtin!

Lê belê ev ne raştiya mijarê ye. Di raştî de beşdarînekirin di hîlbijartinan de û dengnedan bi cêladan, hawareke din a civakê ye ku bi şêwazekî din tê hildan. Li welatekî ku deşhilata mirovkuj, tenê zimanê gefê fêma dike û kuştinê jî weke riya çareserkirina pîrsgirêkan dibîne, baykotkirina şanogeriyan vê rejîmê dikare koşka wan a ji pûşikan tîk bibe.

Eger civak di vê rojê de beşdarî piroseya dengdanê nebe, bi vî awayî dikare dengê xwe ê nerazîtiyê hilde û ji cîhanê re bêje ku êdî siyasîyên xapandinê ên rejîmê nikarin wan bixapînin.

Şamlû ji zimanê Margot Bîkl dibêje di bê dengbûnê de gelek tiştên negotî hene.

Di raştî de bêdengbûna xelkê di roja 2ê Reşemê de jî dikare hawareke mezin û dîrokî a xwestekên rewa bîne ziman. Bêdengbûneke berfireh li hemû bajaran û gireva giştî û çolkirina bajar di vê rojê de dikare bibe mezintirîn hawar û tîkçûna sîstemeke rizî û gemar di mejiyê dîktator de deng vede.

Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê di asta berpîrsên yekem de kom bûn



ناوهندی هاوکاری حیزه‌گانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

Roja Sêşemî, 8'ê Rêbendan, civîna Navenda Hevkarî ya Partiyên Kurdistanê Îranê di asta berpîrsên yekem de pêk hat.

Deştpeka civînê bixêrhatina amadebûyan ji aliyê “Mîstefa Hicrî”, Lêpirsyarê Giştî ê PDKÎ û berpîrsê Dewra Navenda Hevkarî ve hate kirin.

Piştî bo rêzgirtin ji canê paqij ê qurbanîyên erdheza Bakurê Kurdistanê û hemû şehîdên Kurdsitanê xûlek bi bédengî bi pê ve sekînan. Piştî vê, deştûra kar a kom-bûnê xistîne ber nerînên ama-

debûyan û piştî erê kirinê, yekem beşa civînê ku ji nerîn û gengeşe kirin li ser kar û peywendiyên Navendê, û li ser asta navnetewî û girêdayê pîrsa Kurd li Rojhilatê Kurdistanê pêk hatibû.

Piştî gengeşekirina wê mijarê, civîna xebata Navendê bilind hate nîrxandin û komek ji raspardî û biryar bo bi encam gihîştina bernameya karê Navenda Hevkarîyê bi hinek ji wan hevalên ku hey'etê diyarî kirine spartin.

Di pareke din de, bas li ser rewşa rejîma Îranê û li ser wan kirîzan bû ku, hemû alîyêke sîstem û deştîlata rejîmê ji xwe ve girtiye û rejîm ji her aliyekê ve raştî paşxistin û dûrketinê kiriye, di wê derheqê de baseke hûr li ser hate kirin, û piştî wê basê ku heştîyarbûna rewşa Îranê û Kurdistanê û seha welatparêzî û mafxwaziya

xelkê Kurdistanê ku, xwe di wan xwenîşandanên çend mehên derbasbûyî de nîşan dan ku, li hemberî siyaseta zilm û zordariya rejîmê, bi serhildana giştî û netrisane ya xwe ve dane xuya ku, xortên gelê Kurd li hemberî dîktator û kevneperestî di xebat û berxwedana xwe de, heya gihîştin bi armancên siyasî û netewî yên xwe dê xebatê didomîn in.

Di vê civînê de, tevî bilind nîrxandina çalakiyên pir ji şanazî yên xelkê Kurdistanê û bajarên din yên Îranê, li ser berfirehtirkirina xabata giştî û xurtirkirina wan çalakiyên Navenda Hevkarîyê, di hemû qonaxên xebatê de, bi taybet siyasî û dîplomasiya digel civaka Navnetewî û Partî û aliyên siyasî yên opozîsiyon yên Îran û herwisa aliyên Kurdistanê, biryar dan ku lêjneya Navenda Hevkarîyê çalakiyên xwe xurtirbikin û bo wê mijarê pêngavan biavêjin.

Di wê derheqê de, berpîrsên hey'etê hatine erkdarkirin, ku di warê çalakiyên hevpar yên rêkxistinê û girîngîdan bi xebata medenî û pêşmargayeti û ragihandin, girîngiyeke giştî pê bidin û di warê kiryar de jî, programên Navnda Hevkarîyê cîbicî bikin.

Di dawîya wê civînê de, berpîrsên bilind yên Navenda Hevkarîyê, di rewşeke dostane de, ku di heyama çend demjimêran de bi rê ve çûbû dawî bi karê xwe anî û “Mîstefa Hicrî”, spasiya amadebûyan kir.

Navenda Hevkarî a Partiyên Kurdistanê Îranê

8'ê Rêbendan a 1398'an
28 Kanûna Paşîn a 2020'an

Bi hilkefta salvegera Komara Kurdistanê li Mêrdînê semînarek hate lidarxistin



Di Bajarokê Koser a girêdayî bajarê Merdîn a Bakûra Kurdistanê de semînarek bi hilkefta 2'ê Rêbendan salvegera avabûna Komara Kurdistanê, ji aliyê taya Partiya Azadî a Kurdistanê (PAK)ê ve û bi alîkariya Partiya Sosyalîst a Kurdistanê ve hate lidarxistin.

Roja Înê 4'ê Rêbendan, semînarek li bajarokê Koser a girêdayî bajarê Merdîn a Bakûra Kurdistanê, bona

baskirin li ser Komara Kurdistanê, ji aliyê taya Partiya Azadî a Kurdistanê (PAK)ê ve û bi alîkariya Partiya Sosyalîst a Kurdistanê ve hate lidarxistin. Semînare bi Sirûda netewî a “Ey Reqîb” û xûlek bédengî jibo rêzgirtin ji canê paqij ê Şehîdên Kurdistanê deşt pêkir.

Di wê semînare de “Me'sut Tek” Serokê Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK) ê û “Se'îd Veroj” “Tehsîn Sever” û serokê taya Partiya Azadî a Kurdistanê (PAK)ê li Mêrdînê “Bedran Acar” bo biranîna salvegera avabûna Komara Kurdistanê axivîn.

Her yek ji axînerên wê semînare mijarek û aliyeke girîng ya Komara Kurdistanê bas kirin.

Part û aliyên siyasî ên Kurd li Bakurê Kurdistanê 2'ê Rêbendanê pîroz kirin

Partiyên Siyasî ên Bakurê Kurdistanê Bi hilkefta 74'emîn salvegera avabûna Komara Kurdistanê bi cuda daxuyanî belav kirin.

Partiya Sosyalîst a Kurdistanê (PSK), bi belavkirina daxuyaniyekê yad û bîra damezrandina Komara Kurdistanê pîroz kir û ragihand ku rêbaza Komarê rêbaza me ye.

Partiya Azadî ya Kurdistanê (PAK) jî, bi weşandina daxuyaniyekê yad û bîra damezrandina Komara Kurdistanê bilind nîrxand û tede amaje bi wesiyetname “Pêşewa Qazî Mihemed” Serkomarê Kurdistanê kiriye ku çawa daxwazê ji Kurdan dike bibin yek da ku bikarin bigihîjne mafê xwe.

PAKê ragihandiye, ku Komara Kurdistanê bûye sembola cihê şanaziya hemû Kurdekê li her çar perçên Kurdistanê.



Partiya Maf û Azadîyan (HAKPAR)ê jî bi weşandina daxuyaniyekê bi hilkefta 74'emîn salvegera Komara Kurdistanê, ragihandiye ku: “Em wekî HAKPARê qebûl dikin ku Komara Kurdistanê, rûyê pîroz a diroka Kurdistanê ye.

HAKPARê di daxuyaniya xwe de bi wî awayî amajê bi deskevtên komara Kurdistanê dike: “Di dema deştîlata Komara Kurdistanê de, di warê çand, ziman, huner û wêjeyê de gelek gavên girîng hatin avêtin.

Kêrhatîbûna bêçine



N: Serbest Urmiye

Wekî xuya ye dîsan di meha Reşeme ya îsal de, rejîma Îslamî ya Îranê li gor destûra xwe ya bigehîn, dê bo careke din şanoya bê rûmetkirina demokrasîyê bo gerra yazdehemîn a Meclîsa Şêvra Îslamî birêve bibe. Şanoya hilbijartinê ku li gor ti pêwereke demokratîk ê cîhanî û pesend kirî yê navendên cîhanî yê demokrasîyê ninin.

Diyardeyeke din ku herî pittir rûmetê demokrasî û hilbijartina azad ku wekî eslê serke yê demokrasîyê tê hesibandin, şêlû û pintûtir dike, pejirandina kêrhatîbûn û destnîşankirina berbijêran e bo dengdêran. Yanî derbasbûna berbijêran li pirebaska sîstema welayet a Feqîh û li gor mercên wan. Eşkere ye ku li gor mercên sereke di pêngeha yekemîn de, divêt berbijêr netenê alîgir, belkî bawermendeke/a tevav di hizir û kiriyar de yê/a Komara Îslamî û sîstema welayeta Feqîh be. Hekî ne wekî mirovke/a serbixwe mafê berendamîyê jê re nahê dan. Di herî dawiyê de jî divêt ku berendamên ku kêrhatîbûna wan li gor zagonên hilbijartinan yê rejîmê hatiye pejirandin, pabend û derwest bin li hember Komara Îslamî û siyasetên wê de.

Ciqas mirov jê difikire û heya mirov pittir şarezayê sîstem, siyaset û kiriyarên rejîma Îslamî ya Îranê dibe, ew qas jî meriv ji xwe şerim dike ku kêrhatîbûn û mirovbûna xwe têxe terezûya sîstemeke wiha şêlû û dûr ji pîrensîp de.

Di vir de bi kurtî em dê hewil bidin bal bikeşînin ser felsefeya hilbijartinan bi giştî û sîstema hilbijartin û diyarîki-

rîna berendamên hilbijartina di Îranê de. di dawiyê de xwîner bixwe serpişk e di şirovekirin û hilbijartinê de.

1. Felsefeya hihbijartinê

Têgihandin û têgihiştina welatiyan di pêngeha yekemîn de, felsefe û çarçoveya hilbijartinan destnîşan dike. Welatiyên zane û şareza ku mafdarin li ser çarenivîs, paşeroj, qazanc û zirarên xwe û civaka xwe, bi agahî û zanebûn biriyarê bidin û hilbijêrin. Yanî hewce ye ku kêrhatîbûn yan nebûna berendamên hilbijartinan dengdêr pesend bikin.

Ne parleman cihê kombûna sedî sed a pîsporan e û ne jî ew qas girîng e ku hertimî pîspor û şareza ji aliyê gel ve werin hilbijartin. Ya herî girîng eva ye ku parleman bibe cihê nûnerên tevalî û dengê cur bi cur ê gel. Ji bilî vê çendê jî hizir û ramana giştî piştî ceribandina rastî û çewtiyan dikemile û encama hilbijartinên baştir jê dikeve. Hemû sîstemên serkevtî yê demokratîk ezmûna destpêkeke aloz û bi hewraz û nişîvên cur bi cur in. eva diselimîne ku her serkevtin û cihgîrbûnek pêdiviyê usûl û pîrensîpan e.

Rast e ku dibêjin, hilbijartin bingeh û esla sereke ye di demokrasîyê de ye, lê kengê ye ku ev rastî derdikeve. Gelo kengê hilbijartin demokrarîk e û demokrasîyê tîne? Erê wê demê ye ku berendametî û diyarîkirina nûneran di rewşeke azad de be, yanî mîlmilanê û pêşbazî hebe û hilbijartin qada hevrikiya tevalî di civakê de be. Eva ku di hilbijartinên rejîma Îranê û tev rejîmên totalîter de nahê dîtin. Serbarê hemû rastîyan di vê derheqê de ji aliyê sîstemên totalîter ve berdewam hewil tê dayîn ku civak ji pêvajoya eqlanîkirina hilbiratinan were dûrxistin û dûr ragirtin. Rê nadin ku bawerî anîn bi takekesan û hizrên takekesî ku stûnên demokrasîyê tene hejmar, wekî hewce cihê xwe bigirin ku ew yek jî sedemeke nerênî ye ji bo alozîkirina encamên hilbijartinan bi



qazancê xwe.

2. sîstema hilbijartinê

Di keleka dengdan û dengderan de, sîstema hilbijartinê jî xwediyê girîngiyeke taybet e. Di vê sîstemê de piştî diyarîkirina mafê dengdanê, bas li ser berbijêrên hilbijartinê ye. Ka gelo her berbijêrê ji bo ku di pevajoya hilbijartinê de serkeve, hewceyî bideştveanîna çend ji sedî ji koma dengdan e, serbixwe dikevin qada hilbijartinê yan nûneratiya partî, rêxistin an jî girûpên diyarîkirî dikin ku di sîstema hilbijartinê de hatine şirove kirin.

Ya herî girîng di sîstema hilbijartinê de eva ye ku divêt ev sîstem hertim li gor dem û qonaxa ku civak yan welat tede dimeşe were pesendkirin û guhertin bi ser de were.

3. Hilbijartin di Îranê de

Ya rastî be rêya beşdariyê bi çi merivên serbixwe û nûnerên Partî û rêxistinên ku sîstema welayeta Feqîh napejirînin, di hilbijartinên Îranê ji bo çi derfetekê nahê dayîn.

Aliyê dinê yê di sîstemên hilbijartinan de berçav e, alî yan dezgehên çawdêrên hilbijartinan in. Di sîstema hilbijartinên rejîma Îranê de dezgehê sereke ku rastewxwe ji aliyê rêberê rejîmê anku Weliye Feqîh ve tê rasipartin û endamên wê tene destnîşankirin, Konsera Zêrevan yan em bêjin “şorayê nîgehban” e. Bi kurtî konseya zêrevan eva ye:

Konseya Zêrevan Anku “Şorayê Nîgehban”a Îranê

Di yasaya bingehîn ya rejîme

de hatiye pesendkirin û erkê wê wekî organeke çawdêr bi kurtî wiha hatine şirovekirin:

- 1_ Çawdêrî li se Îslamîbûna yasayan
- 2_ Sepandina hakimiyeta Welayeta Feqîh
- 3_ Parastina destûra bingehîn ya rejîmê
- 4_ Şirovekirina destûra bingehîn
- 5_ Çawdêrî bi ser hilbijartinan de

Di rastî de û di kêleka navenda yasdananê wate Meclîsa Şêvra Îslamî de, Konseya Zêrevan yê bûye sedema bêhitbarkirina vê meclîsê. Erkê wê pêdeçûn û ravekirina tim biriyar û pesend kiriyên meclîsa şêvra Îslamî ye ku dijberî Ola Îslamê û naveroka destûra bingehîn, lê di rastî de hizir û ramanê rêberê rejîmê wate weliyê feqîh nebin.

Ya girîng bo ve mijara me, çawdêriya hilbijartinan di welat de ye ku “şorayê nîgehban” wekî navenda bilind di destûra bingehîn de hatiye destnîşan kirin.

Li gor benda pêncemîn ya erkên konseya zêrevan ku divêt çawdêriya hilbijartinan bike, divêt ku kêrhatîbûna kesên berbijêr berî birêveçûna pevajoya hilbijatrinan bi-pejirîne. (hilbijartin di vir de tenê bo meclîsa Îslamî nine, belkî hilbijartina Serkomarî û şorayên bajar û gundan jî digire). Helbet piştî hilbijartinan jî divêt ku ev konseya encamên hilbijartinan pesend bike û bo careke din kêrhatîbûna hilbijartiyên gel jî pesend bike. (bo mînak di gerra çaremîn ya hilbijartinên meclîsa şêvra Îslamî de kêrhatîbûna nûnerê Kurd yê hilbijartiyê bajarê Urmiyê, pesend nekir û rê neda têkeve meclîsê)

Li gor zagonên Komara Îslamî û di bin çawdêriya konseya zêrevan de, berendamê/a hilbijartinan divêt:

»»»»Doma R:4

1. Bawermendê/a Ola Îslamê be
2. Ji bilî bawermendiya hizrî, divêt bi kiryar jî bawermendê/a Îslamê be
3. Bi bawer û bi kiryar gire-dayî Komara Îslamî be
4. Wefadar û cangoriyê/a sîstema Welayeta Feqîh be
5. Nabe alîgirê/a ti Partî û aliyeke siyasî be ku sîstema Welayeta Feqîh ret bike.

Ka gelo demokrasi û hîlbijartina azad yan em bêjin azadî di hîlbijartinê de ku me bere jî gotibû esl û bingehê sereke ya demokrasiyê ye, tê xuya-

kirin?

Li gor mercen han, gelo çare bo kesên ku li ser Olên din bin, sîstema hizirî û felsefeya Welayeta Feqîh qebûl nebin, ji bilî sîstema Komara Îslamî, hewil bidin sîstemekê din were damezrinadin ku derfetên baştir bo welat biafirîne, çiye? Xwediyên bîr û rayên azad û serbixwe, çawan werin meydana mîlmilanê bo hîlbijartinê? Hîlbijartinek ku divêt qada pêşbazîya hizir û rengen cuda be.

Eva di rewşeke de ye ku di piraniya welatên pêşkevî de û li gor sîstem û felse-

feya hîlbijartinan, mercên berendambûnê, hebûna mafê welatîbûnê, temenê yasayî yê dengdanê, nûnerên Partî û rêxistinên ku yasayê pesend kirine, mirovên serbixwe û... hatine danîn.

Ya herî girîng rêjeya dengên gel e ku divêt berendam bideştve binin, wate gel û dengder kêrhatîbûna berbijêran deştîşan û pesend dîkin. Lê di rejîma Îslamî ya Îranê de, serok û nûnerên meclisa şevra îslamî û heta Serkomar û ... ji berî ku bibin serok û nûner, divêt bibin berendamê hîlbijartinekê ku hewce ye kêrhatîbûna wan ji

aliyê şorayê nîgehban ve bê pesendkirin û piştî bikevin ber dengê gel û piştî serkevîtin di pêvajoya dengdanê de jî dûbare dibe ku heman şora hîlbijartin û kêrhatîbûna wan bo careke din bipejirîne. Ka gelo serbarê deştîşankirinê, pesendkirina dûbare ya hîlbijartîyan piştî dengdanê û herwiha pesendkirina yasayên ku piştî hîlbijartina di meclisê de tên pejirandin, çi rûmetekê ji gel, dengê gel û nûnerên gel re dihêle? Îca hekî di vir de rûmetek ji nûner, deng û dengder re hebe, her kes serpişk e rûmet û kesayetîya xwe têxe terezûya hîlsengandina vê sîstemê de.

Peyama Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê bi boneya erdheja Bakûra Kurdistanê



ناوهندی هاوکاری حیزبهکانی کوردستانی ئێران
Cooperation Center of Iranian Kurdistan's Political Parties.
مرکز همکاری احزاب کوردستان ایران

Civatên xelkê Kurdistanê!

Kom û civatên mirovhez

Wekî haydar in şeva Înê, 4'ê Rêbendana 1398'an, hevberî 24'ê Kanûna Paşîna 2020'an, erdhejek bihêz parêzgeha Xarpêt a Bakûrê Kurdistanê hejand ku navenda vê erdhejê, bajarê Sîvrîce bû.

Bi sedema vê bûyera malvêrankar ku roja şundatir deverên din ên wê parêzgehê û herweha parêzgeha Melatiye jî vegirt, mixabin bi dehan hevniştimaniyan jiyana xwe ji deşt dan û bi sedan kes jî birîndar bûne, herweha bi sedan xanî û mal jî herifîne û xelkek zaf bê rê û cih mane ku çarenivîsa hejmarek xelkê hêj nexuya ye û rengê hindê dide ku li jêr kavilk û dar û perdikên xaniyên herifî de mabin. Li gor zaniyariyan, xelkê lêqewimî ên wan deveran ji ber bandora befr û sir û seqemê û herweha ziyanên erdhejê, li rewşek pir xerab

de dijîn û hewcehiya bilez bi alîkariyên mirovî hene.

Navenda Hevkariyê ya Hizbên Kurdistanê Îranê bi vê boneyê ve, hevxiyê bi kes û karên gorîyên vê karesata xwezayî re dike û hêviya başbûn û saxlemiyê bo birîndaran dixwaze.

Herweha daxwazê ji xelkê welatparêz ên Kurdistanê, mirovdostan û kom û civatên mafên mirovî û xêrxwaz dike ku bi her awayê mumkin, bi hawara xelkê lêqewimî ên deverên erdhejlêdayî ve biçin û alîkariyên mirovî ên bilez û hewce bigehînine wan, û rê nedin ku sir û seqema zivîstanê jî bibe sedema kûrtirbûna vê birîna mezin.

Navenda Hevkariyê ya Partiyên Kurdistanê Îranê

6'ê Rêbendan a 1398'an

26'ê Kanûna Paşîna 2020'an

Partiya Demokrat serdana "Partiya Kirêkaran û Rencderan a Kurdistanê" kir



Şandeke Pêwendiyên Kurdistanê ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê, serdana Partiya Kirêkaran û Rencderan a Kurdistanê kir.

Roja derbasbûyî, rêketa 12'ê Rêbendanê, bi hilkefta 25'emîn salvegera avabûna Partiya Kirêkaran û Rencderan a Kurdistanê, şandeke Pêwendiyên Kurdistanê ya Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê bi serpereştîya "Mihemedsalih Qadirî", serdana wê Partiyê kir.

Şanda Partiya Demokrat ji aliyê "Bapîr Kamela", Sekreterê Partiya Kirêkaran û Rencderan a Kurdistanê û endamê Serkirdayetîya wê Partiyê ve pêşwazî ji wan hate kirin.

Di vê dîdarê de, "Mihemedsalih Qadirî" bi nûneratiya PDKÎ, pîrozbahîya 25'emîn salvegera avabûna Partiya Kirêkaran û Rencderan a Kurdistanê kir, û tevî bilindnirxandina hev helwestiyên her du alîyan li pêwendî digel pirsên netewî û niştimanî, pêdagirî li berdewamiya pêwendiyên dostane û hevkarîya navbera wan de hate kirin.

Urmiye di bin gefên berdewam de ye



N: Dara Natiq

Xelkê Îranê bi giştî û yek ji wan neteweyan ku di bin dagirkariya rejîma terorîst a Îranê de ye Rojhilatê Kurdistanê ye, bi salan e ku bûne goriyê siyaseta qirêj û biyom yên rejîma Îranê. Bajarê Urmiyê a Rojhilatê Kurdistanê, cuda ji siyaseta înkâr û bînpêkirina mafê neteweyî û zîlm û zor û bêdadî a bi ser civakê re, tinekirin û asimîlekirina çand û nasnamey Kurdan, di warê aborî û nebûna xizmetguzarî û tinekirina derfet û delîveyên karî de jî, roj li pey rojê tevî arîşe û girêpêçkên mezin re rû bi rû dibe û jiyanê rûniştîyên Urmiyê û bajarên ser bi vê parêzgehê bi zehmetî derbas dibe.

Rejîma mirovkuj a Îranê bi dirêjahiya deshîlata xwe, hertim bi çavek emnîyetî mêzeyî Rojhilatê Kurdistanê kiriye û ji ber vê hindê hertim hewildaye ku cuda ji înkarkirina mafê wan, xelkê Kurdistanê hertim di rêyên cur bi cur û bi zehmet kirina jiyanê re, wan ceza bikin û hevî û îradeya wan bo jiyan û berxwedanê di bingehe de bifetisînin. Di dawî pîlana rejîmê bo zext û givaşxistina ser xelkê gef ji hin bajarên parêzgeha Urmiyê xwariye ku, bi hegera bikaranîna zêde a gazê, dê gaza wan bajaran qut bike.

Serokê Pêwendiyên Giştî ê Kompaniya Gaza parêzgeha Urmiyê “Mihemed Sebûrî”, ragehandiye ku, bi sedema sarbûn û hatina xwarê a pileya heva û bikaranîna zêde a gazê, wisa kiriye ku gaza surûştî a bajarê Xoyê, Selmas û Pîranşar yê were kêmkirin



û bi wê sedmê gefa qutkirina Gaza Siruştî ji wan bajaran xwar.

Eve jî di halekê de ye ku, li heyama çend roj beriya niha, Wezîrê Neftê yê rejîmê, Bijen Zengenê, di civîneke rojnamevanî de gotibû: “Me ew boriyên gaza ku daye Îraqê, di derheq wê de me heya niha ti pareyek li welatê Îraqê vernegirtiye. Rejîma Îranê tevê wê ku, heya niha perê gazê li welatê Îraqê nestandiye, gef ji hin bajarên parêzgeha Urmiyê xwariye ku, bi hegera bikaranîna zêde a gazê, dê gaza wan bajaran qut bike.

Îran bi giştî û Kurdistan bi taybetî xwediyê çavkaniyên herî mezin û dewlemend yên bin erdê ne û lê eva heyî û sermayeya welat û nemaze Kurdistanê bi salane ji aliyê mafiyayên ser bi rejîmê ve tê talankirin û cuda ji dizî û fesad û gendeliya navxwe, pişka herî zaf a vê sermaye mezin ji bo têkderî û şer û aloziyên di Rojhilata Navîn û destêverdan di kar û barê welatên cîran û saportkirina girûpên terorîstî û yên şerxwaz ê girêdayî nîzamê ve tînin serfikirin.

Di demekê de ku xelkê Îranê bi giştî û yê Kurdistanê bi taybetî di rewşeke xirab û aloz a jiyanê de derbas dikin û bingeha aboriya welat bi tewahî rawtî kirîzek mezin

hatiye û jiyanê pir zehmet dimeşe, lê Gaz û Neft û çavkaniyên bin erd a welat û nemaze Kurdistanê ji bo hêz û girûpên têkder û terorîst yê girêdayî rejîmê di deverê û welatên derdor de bi awayekî belaş tê şandin û xelkê belengaz yê Kurdistanê û Îranê bi giştî ji wan îmkânên heyî û hewce tîne bê parkirin.

Herwekî ku di derbazbûyî de jî rû daye, rejîm bi armanca guherîna demografiya navçeyê û hewla asimîlekirina navçeyê, niha jî berdewam e li ser guherîna navê şeqam û bajarên Kurdistanê bi Turkî, û berdewam ev hevvelatîyên Azerî han didin, bona sazkirina tevdanî û têkderî û netebahiyan. Wer-girtina axazadeyan, hiqûqên bêreje, gendeliya îdarî bi taybetî li şaredariya Urmiyê, vegeşîna diyardiyên wekî xwezokî, leşfiroşî, zarokên kar, beşeke din ji wan arîşeyan in ku rojane tîne dîtin.

Ji aliyekî din ve jî rewşa gola Urmiyê ku niha wekî girîngtirîn kirîza jîngehî ya Îranê tê hesabê, her wekî xwe maye, û rejîm ne tenê li hemberî qedera wê de xwe bi berpirsyar nizane, belkî li parêzgehên wekî Tewrêzê bo hênikkirina karxaneyanê navdewletî ji wê kême ava ku dirêje nava behrê de, mifayê werdigre, û bi dizîna ava navçeyên Kurdistanê wekî

Soma û Biradoşt û Şipîranê bo navçeyên çandiniyê ên wekî Qerebax û Necefabad, li derodra bajarê Tesûcê, wan navçeyan pê têrav dike. Rojane xelkê belengaz û kasibkar yê bajarên ser sinor bi gulleyên raşterast yên kirêgirtiyên rejîmê ve tînin kuştin û brîndarkirin û tînin qorbanîkirin. herêmên Kurdakincî yê parêzgeha Urmiyê û nemaze bajarên derdora wê yê wekî Makû, Xoy, Selmas, Şino, Pîranşar û yên din ku dikevî ser sinoran, ji xizmetguzariyên hewce tîne bêparkirin û di rewşekê pir emnîyetî û jiyanek bi zehmet re derbas dibin.

Binçavkirin, kuştin, îdam, kuştina kasibkaran, nebûna derft û delîveyên karî, bi talan birina heyî û samana wan herêman ji aliyê mafiyayên rejîmê ve, beşeke ji jiyan û tirajîdiya xelkê wan deveran.

Rojhilatê Kurdistanê bi giştî û parêzgeha Urmiyê jî yek ji wan herêman in ku bi taybetî, bi salan e ku di bin siyaseta tinekirina nasnameya neteweyî, guherîna demografiya herêmî, nebûna xizmetguzariyê, nebûna delîveyên karî, çekirina arîşe û girêpêçkên civakî, bi talanbirina çavkaniyên dewlemend yên bin erdê yê wan herêman, û bînpêkirina mafê mirov û milîtarîzekirinê re derbas dibe û jiyanê pir bi astengi û zehmetî derbas dibe.

Nerîna Lîderan



Mike Pompeo:

“Herçiqas pare û dolar, kêr bigihîje destê Ayetûllahan, baştir e”.



Mesrûr Barzanî:

“DAIŞê niha ji 2013’ê zêdetir endam hene”.



Mezlûm Kobanî:

“Em daxwazê ji Encûmena Asayiş a Netewên Yekgirtî dikin ku piştgiyariya me bike, çimkî Tirkîyê heremên Rojavayê Kurdistanê yên dagîr kiriye, rêxistina DAIŞê zindî dike, û piştgiyariyên loceştîkî, mirovî û erdnîgarî dide wê rêxistina terorîstî”.



Ebas Mûsewî:

“Rewşa Îran û Amerîka bi navbeynkaran çareser nabe”.

Gotegota hebûna Corona berî Çînê li Îranê



N: Eskender Ceiferî


Di nav torên civakî de û çalakvanên navxweyî Îranê dibêjin berî ku Corona li Çînê hebe, li Îranê derketibû lê belê rejîma Îslamî a meleyan hebûna wê veşartine. Ew dibêjin mirina welatiyan bi sedemên nediyar ku hevdem ligel xwepêşandanên nerazîtiyê ên ji bo dijatiya nirxa bîznîsê derketin, ne bi wê Anfolanziyê bû ku rejîmê behsa wê dikir. Lê belê bi heman vîrûsê bû ku niha weke Corona tê binavkirin.

Sê mehan beriya niha li bajarên cuda ên Îranê bi sedan welatiyan li nexweşxaneyan jiyana xwe ji dest dan ku taybetmendiya nexweşiyê wan jî wek a Corona bû û ji nişkî ve germa bedenê wan zêde dibû, sermayê kar li wan dikir û piştî heyamekê ji ber çikbûna şiyana nefeskişînê jiyana xwe ji dest didan. Tevî ku rejîmê ew weke Anfolanziya binav kiribû, lê belê amaje û taybetmendiya wê, weke ti yek ji wan Anfolanziyan nebûn ku li Îranê hatibûn dîtin.

Deh rojan berî ku vîrûsa Corona li Çînê xwe nîşan bide, li Îranê amadekarî dihatin kirin ku festîvalek li navçeyên rojavayê Îranê weke Hemedanê bê lîdarxistin ku ji bo nasandina vî welatî bo geştyarên Çînî bû û biryar hatibû standin girûpên Çînî ji bo nasandina çanda ku rejîmê weke çanda Îranî binav dike, serdana vî welatî bikin.

Eger dengê çalakvanên navxwe derneketa, belkî rejîmê ew festîval jî di dema xwe de lîdar bixîsta.

Niha jî tevî ku wezarata Tendiristiyê a Îranê dixwaze êdî heya nemana Corona, geşta balafiran ji bo Çînê û ji Çînê bo Îranê bêne ragirtin,



lê belê rejîmê ti biryarek di vê derbarê de nestandiye. Kîyanûş Cehanpûr berpirsê pêwendiyên wezareta Tendiristiyê a Îranê ragihandiye eger pêşiya geşta balafiran neyê girtin, ewê bi awayekî fermî ji dewletê bixwazin rê li ber hatin û çûna balafiran bo Çînê bigire.

Ev jî di demekê de ye ku piraniya dewletên rojava, geşta balafiran bo Çînê sekinandine û ew welatiyên ku ji rojava dixwazin berên xwe bidin Çînê, riya xwe dîtin. Ew diçin Îranê û ji wir derbasî Çînê dibin. Bi vî awayî jî dibe ku metirsiya vîrûsê li ser Îranê zêde bibe eger berê derbasî Îranê nebe jî.

Eger dorpêça Dewletên Yekbûyî ên Amerîkayê li ser heb û dermanan li Îranê nebûya, mirov dikaribû bifikire ku rejîma Îranê pêgeheke baş di warê tendiristiyê de heye û piştî wan germ e. Lewma jî bi vî rengî bê xem in û dikarin li hemberî vîrûsa mezin derkevin.

Vîrûsa Corona û belavbûna wê gelek gumanbar bû. Vê vîrûsê ne tenê bandor kire ser tendiristiyê welatiyên wan cihan ku vîrûs li wir derketiye lê belê bandora herî zêde li ser abûriya cîhanê bû û di rojên derbasbûyî de heya niha nirxa petrolê bi qasî zêdetirî 22 ji sedî daketiye. Ev jî dikare gumana ku ji dema peydabûna vîrûsê ve li Çînê çê bû xurttir bike. Tê gumankirin ku ev vîrûs, çekekî biyolojîk be ji bo jinavbirin yan jî lawazkirina desthilata wan dewlet û sisteman ku dijberên DYA ne.

Hevdem saziya Welatên Henardekarên Petrolê bi navê OPEC, biryar standiye ji bo rêgirtin ji daketina nirxa

petrolê, berhevanîna rojane a petrolê bi qasî 500 hezar bermîlan kêr bike. Tê zanîn piştî ku hêzên DYA li Kendavê bicî bûn, rejîma Tehranê ji bo ku nirxa petrolê bilind bibe, di riya çekdarên xwe re li Yemen û Seûdiyê êrîş kire ser parzîngeha AR-AMKO. Ev deh meh bûn ku ji bo vî karî hatibû pilankirin. Lê bi derketina vîrûsê, têkbirina tenahiya Kendavê jî nikare Tehranê ji daketina nirxa petrolê rizgar bike û êdî nirx gihaye asta wê demê ku hîn ew kiryar ji aliyê rejîma Tehranê ve nehatibûn encamdan.

Bi van pêşbîniyan, eger Corona çekekî biyolojîk be, dîtina waksena wê jî dijwar dibe. Rojava jî hewl dide li hemberî vîrûsê derkeve. Alman û Feranse bixwe, xwe di eniya DYA de weke renxegirên Îran û Çînê binav dikin, lê belê di rastî de hewl didin piştî wan jî bernedin. Ew didin xuyakirin ku hewl didin di çend mehên bê de ji bo rizgarkirina xelkê, waksena Coronayê berhem bînin. Eger ew hevpeymanên DYA ku dilê Îran û Çînê jî xweş dikin, bikarin vîrûsê berhem bînin jî, lê ne xuya ye heya wê demê, Corona bikare canê çend kesan bigire û çiqasî di nav xelkê de berfireh bibe. Tevî ku heya niha Çîn û Îranê, hejmara rastîna qurbaniyên vîrûsê belav nekirine, lê Çîn bixwe mikur hatiye ku wan xemsarî kiriye û dîsa jî Îran dibêje kiryarên Çînê ji bo lihemberderketina Coronayê gelek mezin bûn. Çîn hîn mikur jî nehatiye ku çendîn pizîşkan berî çend mehan hişdarî dabûn ku vîrûseke nû û gelek metirsîdar derdikeve lê ew pizîşk bi tometa belavkirina piropagendeyan li dijî dewletê hatibûn girtin.

Plana Trump ya ji bo aştiyê di navbera Îsraîl û Fîlîstîniyan de û bandora wê li ser Rojhilata Navîn



N: Ebdulêzîz Qasim

Piştî çend salan ji rawestandina gotûbêjan di navbera Îsraîlê û Fîlîstîniyan de ji ber gelek sedem û astengiyan û herwiha peyda bûna gelek krîzên din li rojhilata navîn bi taybetî krîza Sûriyê û niha jî krîza Lîbiya, careke din pîrsa aştiyê di navbera Fîlîstîniyan û Îsraîlê de dikeve rojevê yekser piştî hevdîtina serokê Amerîkayê Donald Trump ya vê dawiyê digel Serokwezîrê Îsraîlê Benjamin Netanyahu û herwiha digel rêberê opozîsyona Îsraîlê Benny Gantz re. Serokê Amerîka digel Serokwezîrê Îsraîlê planek ji bo aştiyê di navbera Fîlîstîniyan û Îsraîlê de aşkere kir, ku ev plana gelek caran digel hin welatên Erebi hatibû gotûbêj kirin û bi taybetî li Menamê li Behrê û li gorî daxuyani-



yên serokê Amerîka ku ev plan rê dide ji bo avakirina dewleta Fîlîstîniyan û herwiha ku bi kêrî hemû aliyên li rojhilata navîn tê, û heger ev plan ser bikeve bi çareser kirina pîrsa “Orşelîmê” wê aloztirîn pîrs li rojhilata navîn çareser bibe.

Tiştêke asayî ye ku wê reaksiyonên cuda hebin li ser vê pîlanê, nemaze ji aliyê Fîlîstîniyan û Ereban, tevî ku berî ev plan ji aliyê Qesira Spî aşkere bibe, ji aliyê serokê rêveberiya Fîlîstîniyan Mehmûd Abas ve hate redkirin, û herwiha Qesira

Spî jî di wê baweriyê de ku ev plan wê bi hasanî ji aliyê Fîlîstîniyan ve qebûl nebe, nemaze ji aliyê komên îslamî yên radîkal ve, wekî bizava Hamas li Gazayê û ji bo vê yekê Amerîka 4 sal wekî muhlet daye ji bo pêkanîna plana aştiyê û Amerîka daxwaz ji welatên Erebi yên bi bandor kiriye ji bo piştgiriya vê planê ku di baweriyê wê de li dawiyê wê qebûl bibe.

Lê tiştê ne asayî û ne normal daxuyaniyên Erdogan û Cavad Zarif bûn, ku wan çî maf û çî pêwendî bi pîrsa Orşelîmê û Fîlîstîniyan nîne,

û îro pêdivî bi helwestek erebî heye li dijî destêwerdanên Tirkîyê û Îranê di nav welatên Erebi de û di vir de giringiya kuştina terorîst Qasim Silêmanî xuya dibe, ku helbet ev terorîst wê bibe rêgir li pêşiya redkirina plana aştiyê di navbera Îsraîl û Fîlîstîniyan de, ku Îran û Tirkîyê li ser krîz û aloziyên li rojhilata navîn mezin dibin, hevdem ku roj bi roj destêwerdana wan di karubarên gelek dewletên deverê de bi rêya xudankirina grûpên radîkal û terorîst wekî Îxwan Mislimîn, Hamas, Nusre û Hizbulah zêde dibin, ku divê dewletên erebî nemaze Misr û Erebiştana Siûdî li ser vê planê bi biryareke dîrokî rawestî û nehêlin biryara Fîlîstîniyan (ya lawaz) bikeve di dest her du bazirganên şer û krîzên mirovî de, û herwiha ji dewletên erebî tê xwestin ku pîrsa kurdî li Sûriyê û Îraqê çareser bikin, ji ber bi çareser kirina pîrsa kurdî li Sûriyê û damezrandina dewleteke kurdî li Kurdistanê başûr wê helbet bikeve di berjewendiya hevbeş ya Kurd û Ereban de, herçende ku avakirina dewletekê ji bo Fîlîstîniyan dibe bibe fersende ji bo avakirina dewleteke kurdî jî.

Donald Trump plana xwe ya bi navê “peymanî sedsale” eşkere kir

Serkomarê Amerîkayê “Donald Tramp” plana xwe ya ji bo aştiya Rojhilata Navîn ku weke “peymanî sedsale” bi nav dike, eşkere kir û got ku Orşelîm dê wekî paytexta yekparçe ya Îsraîlê bê qebûl kirin û bila dewleta Fîlîstînê were avakirin.

Donald Tiramp digel Serokwezîrê Îsraîlê Benyamîn Netenyahû li Koşka Spî civîneke hevpar a çapemeniyê pêk anî û plana xwe ya aştiya Rojhilata Navîn wekî “peymanî sedsale” binav dîkir ragihand.

Donald Tiramp ragihand ku plana aştiyê 80 rûpel e, û plan hem ji bo aliyê Îsraîlê û hem jî yê Fîlîstînê dê gelekî

qazancê hebe.

Trump herwiha got, ku plana aştiyê ya Rojhilata Navîn ji bo Fîlîstîneke serbixwe û Fîlîstîniyan “şansê dawîn” e, û çareseriya du dewletî vê gefa Fîlîstînê li ser Îsraîlê kêmkir.

Gorî wê plana Tiramp: %30 Kerana Baxterî dê ber Îsraîlê bikeve Taxên Orşelîmê ku bendên ewlehiyê derbas bin, dê axa Fîlîstînê bê hesabê.

Girûpa Hamasê dibe bi tewawî bête çekkirin.

Fîlîstîn dibe dewletbûna Îsraîlê bi fermî nas bike. Heyamê 4 Salan bê diyarîki-



rin bona veguhasînê.

Fîlîstînî dikarin Qiraxavên Heyfayê bo xwe bikar bînin.

Fîlîstînî dikarin li ser erdê xwe yên aliyê Ordonê werzîgariyê bikin

Rewşa tendirustî ya hepsiyeke siyasî ê Kurd di girtîgeha bajarê Urmîyê de nebaş e

Rewşa tendirustî ya hepsiyeke siyasî ê Kurd yê bi navê “Siyamek Eşrefî” xelkê gundê “Welinde” ya ser bi bajarê Urmîyê nebaş hatiye zanîn.

Navbirî bona nerizayetî nîşandan li derheq azadkirina bê merc û bêrezi kirina fermanbererê taya 9 a berêveberê tawanên dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê, deşt avêtibû bi gerêv girtinê.

Ew hepsiye siyasî ê Kurd, roja Sêşemî 1`ê meha Rêbendanê, deşt avêtiye bi girev girtina birçibûnê û ragihandiyê, ku heya dema cîbicîkirina xwestên xwe, dê deşt ji girevgirtinê ber nede.


Daxwazkariyên azadiya bê merc a wî hepsiye Kurd ji aliyê taya 9 a berêveberê

tawanên dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê ve hatibû redkirin, û navbirî daxwaza pêdaçûn li ser daxwazên xwe kiriye.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar di girtîgeha bajarê Urmîyê de, ew girtiye siyasî bi sedema gireva birçibûnê, tendirustiya wî rastî metirsiyê hatiye.

Herwisa wê çavkaniyê gotî ye, heya niha berpirsên girtîgeha bajarê Urmîyê ji derheq girevgirtina wî girtiye siyasî kintir xem bûne.

“Siyamek Eşrefî” berê endamê yek ji Partiyên Kurd yê dijberî hikûmeta Îranê bûye, û di meha Cozerdana sala 1395`an de, piştî vegeriya wî bo Rojhilatê Kurd-



istanê, ji aliyê hêzên Îtîla`atê ve hate binçavkirin û piştê ji aliyê dadgeha şoreş a bajarê Urmîyê ve, bi 5 sal û 8 meh hepsa te`izirî hate cezadan.

Ew hepsiye siyasî 3 sal û 8 meh e ku di girtîgehê deye.

Kolberekî temen 55 salî bi sedema sir û seqemê canê xwe ji deşt da

Roja Şemî, 12`ê Rêbendanê, kolberekî Kurd yê bi navê “Osman Fitûhî” naskirî bi “Osman Elî Mîna”, yê temen 55 salî û xelkê gundê “Mêşaw” û rûniştîyê taxa Tazava ya girêdayê bajarê Seqizê, bi sedema sir û seqemê canê xwe ji deşt da.

Herwisa du kolberên din yê bi navên “Emîr Kerîmzade” xelkê gundê “Dereziyaret” û “Emîr Turcanî” digel “Osman Fitûhî” bûn ku li derheq rewşa wan ti zanyariyek ji ber deşt de nîne.

“Osman Fitûhî” xwediyê 5 zarokan e, ku bi sedema dabînkirina jiyana xwe ji rêya kolberiyê ve, rû li deverên sînorî yê Kurdiştanê kiribû.

Roja Înê, 11`ê Rêbendanê, hejmarek ji kolberan ku di sînorê “Sêkuçke” ya girêdayê bajarê Seqizê, di nava befr û bagerê de asê bibûn, bi hewkariya rûniştîyên wê deverê ji mirinê rizgar bûn.

Du Kolberên Kurd li ser Sînorê Kutul (Qutor) a Bajarê Xoyê hatine birîndarkirin

Roja Yekşemî, 6`ê Rêbendanê, 2 Kolberên Kurd bi navên “Elî Hadîzade”, 22 salî, kurê “Bîşar” û herwisa “Husên Hadîzade”, 29 salî, kurê “Cemîl”, rastî gullereşandina hêzên artêşa Tirkîyê hatin û di encam de, bi dijwarî birîndar bûne.

Ew 2 Kolberên Kurd, xelkê gundê “Gîweran” a girêdayê dervera Qutor in.

Di wê bûyerê de, serê “Husên” bi gulleyên arteşa Tirkîyê biîndar bûye û herwisa, piştî “Elî” jî ber 2 gulleyan ketiye.

Ew 2 kolberên Kurd, niha di nexewşnaxa bajarê Van a Bakurê Kurdiştanê de ne û rewşa tendirustiya wan ne başe.

Berpirsên rejîmê gef xwarine ku dê gaza parêzgeha Urmîyê qut bikin



Rejîma Îranê tevê vê ku, heya niha perê gazê li welatê Îraqê rnestandiye, gef ji hin bajarên parêzgeha Urmîyê xwariye ku, bi hegera bikaranîna zêde a gazê, dê gaza wan bajarên qut bike.

Serokê Pêwendiyên Giştî ê Şirketa Gaza parêzgeha Urmîyê Mihemed Sebûrî, gotiye, bi sedema hatina xwarê a pileya heva û bikaranîna zêde a gazê, wisa kiriye ku gaza surûştî a bajarê Xoyê, Selmas û Pîranşar bê xwarê û bi wê sedmê gefa qutkirinê li ser wan bajarane ye.

Eve jî di halekê de ye ku, li heyama çend roj beriya niha, Wezîrê Neftê yê rejîmê, Bijen Zengenê, di civîneke roj-namevanî de gotibû: “Me ew boriyên gaza ku daye Îraqê, di derheq wê de me heya niha ti pareyek li welatê Îraqê verne-girtiye.

Rejîma Îranê bo dijî xelkê xwe çeleng e, û her biryarek hebe li dijî berjiwendiyên xelkê xwe dike û dipejirîn e.

Rejîm bi wî awayî perê xelkê Îranê, hemûyê terxanê kiryarên terorîstî di derveyê welat de dike.

Pêşbirkêya “Kurd Dengbêj” di parêzgeha Urmiyê de du qonaxên xwe dawî pê anî û qonaxa dawî jî wê di rojên bê de bi rê ve here



Dengbêjî kevneşopîyeke gelekî girîng ji bo çanda kurd e, û ji hunera xwendina kilamên gel ên kurd re tê gotin.

Di dîrokê de kurd tim neçar mane ku çanda xwe bi “deng” yan jî “gotinan” bi cîh bînin.

Li her çar parçeyên Kurdistanê çanda gelê Kurd ya herî kevnar, dengbêjî li ber pergala sedrem li ber xwe dide. Dengbêjî bîngeha dîrok û wêjeya gelê Kurd a devkî ava dike û bi saya dengbêjan ev dîrok û wêjeya devkî digehe nîfşên nû.

Bi wî awayî dengbêjî ev kevneşope di nav gel de her berde-wame.

Di vê derheqê de dengbêjên parêzgeha Urmiyê, pêşbirkêya

Kurd dengbêj lidar xistin, û di vê pêşbirkêyê de çendîn kesên dengbêj yên bajarên, Urmiyê, Xoyê, Selmas, Çaypar, Çaldiran û Bazirgan û gelek deverên din ên bajarê Urmiyê beşdar bûn û xwe hilbijartin.

Di qonaxa yekem de 65 ciwanên dengbêj hatibûne hilbijartin, û bi dengên xwe yên xweş ev pêşbirkêye xemilandin.

Di beşa yekem de 20 kes ji wan dengbêjên beşdar ji aliyê karnas û dawerên pêşbirkê ve hatine redkirin, û ev dengbêjên din yên manî jî derbasî qonaxa duyem bûn.

Beşa du a wê pêşbirkêyî jî di çend rojên derbasbûyî de hate lidarxistin, di vê pêşbirkêyê de jî, dengbêjan stranên bi awayekî dengbêjî strandin, û bi karnasiya wan karnas û dawerên wir, pûan ji wan re hate dan û herwisa vidiyoyên wan dengbêjan jî xistîne ber dengdanên xelkê ku denge erênî û nerênî dane wan.

Bi wî rengî di nav wan hejmara dengbêjan de 6 dengbêj derbasî qonaxa sêhem bûn.

Karnas û dawerên wê pêşbirkêyê jî kesên wekî: Kawûs Milanî, Qinyas Hemîdzade, Riza Henare û Yûsif Kilonekzade û kesên dinin.

Beşa sêhem a vê pêşbirkêyê jî qirar wisaye ku di rojên bê de di yek ji holên bajarê Urmiyê de bi amadebûna dengbêjan û xelkê sîvîl bê lidar xistin.

Dengbêjan li hemberî hemû astengî û hewldanên asîmîlasyonê di paraştina çanda xwe de biserketine û beşeke girîng a muzîk û çanda kurdî gihandine dema me. Bi saya wan kilamên dengbêjîyê ye ku dîroka a Kurdan heya niha zindî ye.

Pirtûka “Xebatên Rewşenbîriya Kurdî li Bakur” belav bû

Berhema “Xebatên Rewşenbîriya Kurdî li Bakur” ku heyama sedsala 20 (1900-2000) li xwe digire û ji aliyê Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê ve hat çapkirin û belavkirin.

Di vê berhemê de xebat û lêkolînên ku ji aliyê şexs, sazî û dezgehan ve li ser Kurdan hatine pêkanîn di sedsala 20an de, cih digirin.

Herwiha ev berhem ji 3 beşan pêk tê ku di beşa yekem de, erdnîgariya Kurdistanê, tevger û saziyên Kurd û Kurdî, di beşa duyem de xebatên çand û hunerî û di beşa sêyem de jî rojname û kovarên bi zimanê Kurdî cihê xwe digirin.

Berhema ‘Xebatên Rewşenbîriya Kurdî li Bakur’ ku ji aliyê nivîskar Miraz Ronî ve hatiye nivîsan-



din, ji 142 rûpelan pêk tê.

Nivîskarê vê berhemê, Miraz Ronî, sala 1966an li Bedlîsê ji dayîk bûye û xwendina xwe ya seretayî û navîn li wî bajarê Bakurê Kurdistanê temam kiriye. Li Zanîngeha Anadoluyê beşa Aboriyê xwendiyê. Di heyama salên 1998-2003 li Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê kar kiriye. Li Zanîngeha Uppsala ya Swêdê, bawernameya mamostetiya zimanê Kurdî wergirtiye û li Zanîngeha Yuzuncu Yıl a Wanê, li ser ziman û çanda Kurdî maştera xwe pêk aniye.

Miraz Ronî bi navê ‘Di Siya Dara Xaçê De’ berhemeke helbestan nivîsandiye û herwiha 2 pirtûk jî wergerandine bo zimanê Kurdî. RÛDAW

Zimanê Kurdî

Hevalkar (hoker) :

Gelek caran, hinek cînavên nenas têgeha demê bi xwe ve digrin û di pêvajoya hevokan de li cihê demê nenas bikar tên Wek :

- Her ez tîm vir ez te nabînim .
- Vê çendê baran nabare . - Ez tibabekê li Amûdê mam .

Di van mînan de ev cînavên nenas (her, çend, tibab) bi wateya demê nebinavkirî hatine : - Her ez tîm : Çi dema ez tîm... - Vê çendê... : Vê demê ... - Tibabekê ... : Demekê ... Bi vî wateyê ew mînak dibin : - Çi dema ez tîm vir ez te nabînim - Vê demê baran nabare . - Ez demekê li Amûdê mam . Diyar e ku ev cînavên nenas, yê ku bi wateya demê nebinavkirî tên û li şûna hevalkarên demî (demikî) bikar tên, ew jî di rêxistina hevokan de dibin hevalkarên demikî (hokerên demane) .

Zaraveyên Bikarhatî (tîm)

- Hevok : Pevek, hevek, rişte .

- Kar : Kirin, lêker . - Karê derhingêv : Karê derbaz, karê têper - Kara : Kirar, kiryar, kirde . - Berkar : Bireser, serve - Berkarê raşteder: Berkarê raşterê, berkarê raştewxo - Berkarê neraşteder: Berkarê neraşterê, berkarê neraştewxo - Verês : Tawang (te-wandin) - Hevalnav : Rengdêr, rewş, (sîfet) . - Hevalkar : Hoker, nîr, (zerf) - Guhêrbar : Tê guherîn . - Neguhêrbar : Nayê guherîn . - (KJ) : Kurmanciya Jorî - (KX) : Kurmanciya Xwarê.

Jêder

1- Qenatê Kurdo : Rêzimanî kurdî be kereştayî diyalêktîkî Kurmancî û Soranî . Mosko (1957) .

Wer .Dr. Kurdistan Mukriyanî, ji Rûsî . Hewlêr (1982).

2- Celadet Bedirxan : Bingehên Giramêra Kurdmanî.

Stokholm – Nûdem (1994) .

3- Reşdê Kurd : Rêziman a ziman ê kurdî . Şam (1956) . 4- Kamîran Bedirxan : Rêzimana zimanê

kurdî . Parîs

(1971) .

5- Sadiq Behadînê Amîdî : Rêzimana kurdî . Bexda

(1987) .

6- Qenatê Kurdo : Rêzimanî kurdî le diyalêktîkî xwarû û jorî . Mosko (1978) . 7- Feqe Huseyn Sagnîç : Rêzimanî zimanê kurdî .

Istanbul (1991) .

8- Tewfîq Wehbî : Deştûrî Zimanî kurdî . Bexda (1929) . 9- Nûrî Elî Emîn: Rezimanî Kurdî . Silêmanî (1960). 10 – Cemal Nebez : Zimanê yekgirtiyî kurdî . Bembêrg (1976) . 11- Ebdurhman Hacî Marûf : Wuşiyî zimanî kurdî .

Bexda (1975) .

12- Mihemed Emîn Hewramanî : Seretayek le fîlolejî

zimanî kurdî . Bexda (1974) .

13- Cigerxwîn : Awa û deştûra zimanê kurdî . Bexda

(1962) .

14- Keça Kurd : Zayenda Mê û Nêr . Berlîn (2001). 15- Dr. Kurdistan Mukriyanî û Dr. Nesrîn Fexrî :

Rêzimanî kurdî. Hewlêr (1982) .

16- Ebdurehman Hacî Marûf : Rêzimanî kurdî – Nav-

Bexda (1997) .

17- Govarî Korî zanyarî kurd, bergî heftem . Bexda

(1980).

18- Govara Peyv, jimar (24) . Dihok (2002) . 19- Govarî Korî zanyarî kurd, bergî dûwem . beşî yekem . Bexda (1971) .

Naverok

Mijar	rûpel
- Deştêk	9 - Cînav di pertûkên rêzimanî de
.....	11 - Beşên cînavan
.....	19 1- Cînavên kesîn
.....	21

A - koma “ Ez “	25
B - koma “ Min “	36
2- Cînavên pirsîyarî	48

Dom heye...

Hêzên Tirkîyê êrîşê li ser hêzên Beşar Esed kirin û Rûsiyê bertek nîşan da

Hêzên atrêşa Tirkîyê êrîşê li ser hêzên Sûriyê kirin û 30 heya 35 kes ji hêzên artêşa Sûriyê kuştin.

Pêka nûçeya Ajan-sa Nûçegihaniya “Anadolu”yê a girê-dayê hikûmeta Tirkîyê, artêşa Sûriyê îro, 14’ê Rêbendana 1398’an (3’ê Şibata 2020’an) li 2 KM rojavayê qezaya “Seraqîb” a girêdayê parêzgeha “Îdlib”ê, xala kontrolkirina Artêşa Tirkîyê topba-ran kiriye.

Artêşa Sûriyê, êrîşa berfireh ya li ser parêzgeha “Îdlib”ê dest pê kiriye ku, di bin kontrola gurûpên çekdar yê dijî rejîma Sûriyê de ye, û pêka rêkevtina Sûçî, ya ku di navbera Tir-kiye û Rûsyayê de ye, 12 xalên leşkerî yê çavdêrî yê Tir-kiyê jî, li ser sînorê wê herêmê hene, ku yekek ji wan xalan li rojavayê Helebê, yek li bakurê Hemayê û 10 xalên din jî li ser sînorê parêzgeha “Îdlib”ê ne.

Di encama vê êrîşê de, 4 leşkerên Tir-

kiyê hatine kuştin û 9 leşkerên din jî birîndar bûne, ku rewşa yekek ji wan birîndaran nebaş e.

Di derheqê vê êrîşê de, Berdevkê Serokomari-ya Tirkîyê, “Îbrahîm Kalin”, bertek nîşan da û got: “xwîna leşkerên me, li ser erdê namîne û bikerên wê êrîşê, dê hesabê bidin”.

Kalin daxuya ku, ev êrîşe li dijî “Rêkev-tina Îdlib”ê hatiye encamdan û tekez kir ku, hêzên Tirkîyê “di cih de bersiv û berteka êrîşê dane”.

Di encama êrîşên berdewam ên artêşa Sûriyê de, Rûsya bi balafirên xwe yê şerker piştgiriyê dide wan, heta niha, 4 xalên çavdêriyê yê Tirkîyê ketine nav sînorê desthilata rejîma Sûriyê û di jêr dorpêça hêzên artêşa Sûriyê de ne. Di wê derheqê de, Serkomarê Tirkîyê, “Recep Teyîb Er-doxan” baskiriye ku, artêşa wî welatî, ber-siveke tund daye êrîşa hêzên Sûriyê ya ku li ser hêzên Tirkîyê di Îdlibê de hatiye en-camdan û got, 30-35

kes ji hêzên Sûriyê, hatine kuştin.

Erdoxan tekezî li ser berdewamiya hebûna leşkerî ya Tirkîyê li Îdlibê kir û got: “Em li ser berdewamiya operasyonên xwe yê li Sûriyê riya in û em dê bersiva her êrîşekê bidin ku li dijî hêzên me bê kirin.”

Erdoxan destnîşan kir, ku di bersivê de, hêzên Tirkîyê “bi topxane û balkafirên şerker yê corê F-16, 40 cihên destnîşankirî yê hêzên rejîmê kirine armanc” û tekez kir, di bersivdana hêzên Tirkîyê de, “pêka en-camên destpêkê 30-35 kes ji hêzên Sûriyê hatine kuştin.”

Bi gotina Erdoxan, artêşa Tirkîyê, piştî êrîşa hêzên Sûriyê “ji demjimêr 06:15’ê sibêzû ve, 122 gul-leyên topê, 100 gul-leyên hawinan, avêtine 46 cihên rejîmê.”

Serkomarê Tirkîyê, herwiha da xuya, ku Tirkiye li hember kuştina leşkerên xwe, bédeng namîne û gotiye ku, em dê li ser



hesabpîrsîna vê yekê berdewam bin.

Wezareta Berevanî ya Rûsyayê, li derheq wê êrîşa îro ya ku artêşa Sûriyê bo ser hêzên Tirkîyê baskiriye ku, hêzên Tirkîyê bê agahdarkirina Rûsyayê, li nav sînorê herêma Îdlibê, dest bi çalakîyan kiribûn, lewma rastî êrîşa hêzên hikûmeta Sûriyê hatine, ku xalên di destê teroriştan de, yê li rojavayê bajarokê “Seraqîb”ê dikirin armanc.

Navenda Rûsyayê bo Lihevanînê ku li Binkeya Leşkerî ya Himêmîmê ye, di daxuyaniyekê de li ser êrîşa îro ya hêzên Tir-kiyê li sînorê Îdlibê, hinek ronkarî belav

kirin.

Pêka daxuyaniya vê navenda girêdayê Wezareta Berevanî ya Rûsyayê, “şeva 2 li ser 3’ê Şibatê hêzên Tir-kiyê bê agahdarkirina Rûsyayê, li nav sînorê herêma Îdlibê dest bi çalakîyan kiribûn.” Navenda Rûsyayê bo Lihevanînê red kiriye, ku Tirkîyê bi balafirên êrîşî ser hêzên Sûriyê kiribe û diyar kiriye, ku “ti balafirên Tirkîyê esmanê Sûriyê der-bas nekirine” û tekez kiriye, “ti êrîşek li dijî binkeyên hêzên Sûriyê nehatiye tomarkirin.”

Herwisa wê navendê da zanîn, ku “hêzên esmanî yê Rûsiyayê bi awayekê berdewam çavdêriya herêma Îdlibê û navçeya kêmkirina aloziyan dikin”.

Birîndarbûn û canjidestdana du kedkarên Rojhilatê Kurdistanê di Hewlêrê û Duhokê de

Li Bajarê Duhokê La ser bi Herêma Kurdistanê, bi hegera bûyera di nav kar de, kedkarekî canê xwe ji dest da û yekî din jî bi giranî birîndar bû.

Roja Pêncşemî 3’ê Rêbendanê, kedkarekî Kurd ê bi navê “Behmen Hesûyan” Kurê Rehîm û xelkê gundê Stûnreş a girê-dayî navçeya Şipîran

a girêdayî bajarê Selmasê, bi hegera hilûşîna xanî bi ser wî de di bajarê Duhok a Başûrê Kurdistanê de canê xwe ji dest da.

Herwisa kedkarekî din jî yê bi navê “Mes’ûd” û xelkê bajarê Urmiyê, bi giranî birîndar bû û bo yek ji nexweşxanên bajarê Duhokê hate veguhestin. Her di vê der-

heqê de, kedkarekî Kurd ê xelkê bajarê Pîranşehrê, ku li bajarê Hewlêrê mijûlê kedkarî bû, bi hegera bûyera di nav kar de, gelek bi giranî birîndar bû.

Xelkê Rojhilatê Kurdistanê li ber nebûna kar û dahatê, neçarîna bona peydakirina nanekî helal rû li Başûrê Kurdistanê bikin, û li



wir jî mixabin bi hegera karê dijwar rastî bûyerên nav kar dibin û canê xwe ji dest didin û birîndar û seqet dibin.